



Makale Geliş Tarihi: 28.05.2018

Makale Kabul Tarihi: 08.08.2018

JI ALİYÊ BINYATÎ VE LÊKER Ê LÊKERÊN VEQETÎNBAR DI ZARAVAYÊ KURMANCÎ DE*

Zana Farqîni**

KURTE

Rêziman wek hêman û stûneke girîng a zimanê nivîsînê ya zimanekî tê hesabandin û ji ber ku şayesandin û peyitandina rêzikên zimên jî li xwe digire, ew bi rola rêbera zimanekî radibe. Di gel vê yekê, gava bi çavekî hûrbînî li pirtûkên rêzimanên kurmancî tê nihartin, tê dîtin ku ne tenê di warê mijarên taybetmend de, her wisan di biwara hin mijaran de ku ew wek ên sereke tên pejirandin, zimannas û rêzimanas ne li hev in û di navbera wan de nêrînên cuda yên berbiçav xwe tafilê didin der. Mîna mijarên cureyên lêkeran û ji aliyê binyatî ve senifana lêkeran.

Di vê xebatê de li ser yazdeh (11) pirtûkên rêzimanê yên zaravayê kurmancî tê rawestandî û bal li ser lêker û ji aliyê binyatî ve senifana cureyên lêkeran tê kêşan. Li ser warên ku bûne mijara xebatê, jî nû ve senifanek der barê cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve tê kirin û bi navê lêkerên veqetînbar jî cureyek lêker li senifanê tê zêdekirin. Ev cure lêker, bi awayekî serbixwe di tu rêzimanê zaravayê kurmancî de cih jî wan re nehatiye veqetandin, lê di xebatên cuda de, ew di nav lêkerên hevedudanî, lêkerên biwêjî û lêkerên bidaçek de hatine nîşandan.

Peyvên Sereke: Lêker, senifana lêkeran, lêkerên veqetînbar.

* Ev nivîsar beşek e ji teza min a bi navê "Binyat û Rastnivîsîna Lêkeran di Berhemên Rêzimanê yên Kurmancîya Bakur de" ku wek gotar di bin vî sernavî de jî nû ve hatiye amadekirin. Teza min a navborî jî aliyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê ve hatiye pejirandin.

** Çendî navê min ê nasnameyê/fermî Mehmet Gemsiz e jî, lê ji ber ku ez bi navê Zana Farqîni tîm zanî û xebatên min hemû bi vî navî ne, loma jî bo gotarê jî min ev navê xwe tercîr kir.

ÖZ

Kurmançî Lehçesinde Yapı Bakımından fiiller ve Ayrılabilir Fiiller

Dil bilgisi, yazılı bir dilin en önemli öge ve sütunlarından bir olarak kabul edilmekte ve bir dilin tasviri ile dilin kurallarının tespitini içerdiği için de o dilin rehberi olarak görülmektedir. Buna karşın, eleştirel bir gözle Kurmançça dil bilgisi kitaplarına bakıldığında sadece spesifik konularda değil genel kabul gören bazı konularda da dil bilimciler ile gramerçilerin uzlaşmadığı ve aralarındaki bariz görüş ayrılıkları da hemen göze çarpacaktır. Fiil türleri ve yapı bakımında fiil türlerinin sınıflandırılması konuları gibi.

Bu çalışmada on bir (11) Kurmançça dil bilgisi çalışması ele alınıp fiiller ile yapı bakımından fiil türlerinin sınıflandırılması konularına dikkat çekiliyor. Çalışmaya konu olan alanlarla ilgili yapı bakımında fiil türleri hakkında yeni bir sınıflandırmaya gidilerek daha önce bağımsız bir ad altında hiçbir Kurmançça lehçesi gramer çalışmasında yer verilmeyen ayrılabilir fiiller adıyla yeni bir fiil türünü de bu sınıflandırmaya dâhil ediliyor. Fakat belirtmeli ki söz konusu fiiller, farklı çalışmalarda birleşik fiiller, deyim fiiller ve edatlı fiiller içinde gösterilmişlerdir.

Anahtar Sözcükler: Fiil, fiil sınıflandırması, ayrılabilir fiiller.

Destpêk

Mijara peyitandina cureyên bêjeyan, mijareke pir kevn e ku li gorî çavkaniyên nivîskî diçe heta berî zayînê. Li Yûnana berê Platon (Eflatûn; B.Z. 427-347) behsa navdêr û lêkeran kiriye û wî ew ji aliyê kategoriya kirde û pêveberê ve ji hev veqetandine.¹ Aristo (B.Z 384-322) jî beşên rapeyvê (nutqê) wekî herf, kîte, gihanek, herfa terîf, navdêr û lêkerê² bi rêz kirine û wî navdêr (onoma) û lêker (rhêma) ji nav wan cihê kirine.³ Lê yê ku rapeyv li heşt beşan (navdêr, rengdêr, herfa terîf, hoker, lêker, gihanek, daçek û cînavk) dabeşandiyê Dionysios (B.Z 170-90) e. Piştî, ji ber ku di zimanê latînî de herfa terîf (artîkel) tune ye û zimanê grekî ji aliyê hebûna cureyên peyvan ve ji hemû zimanên din re nabe bibe mînak, loma ji hêla zimannasan ve bêjeya “baneşan”ê li şûna herfa terîfê hatiye bicîhkirin û bi vê yekê cureyên peyvan gihîştîye heştan⁴, ku roja îro jî ev peyta hanê bi awayekî giştî derbasdar e.

Berhema Dionysios a bi navê “*Tekhne Grammatike*”, ji bilî hevoksaziyê, der barê hemû mijarên zimên de 13 qirn wek deqeke hîmî û sereke li Rojava hatiye pejirandin.⁵ Wê ji bilî rêzimana zimanê latînî, tesîr li rêzimanên neteweyên Rojava jî kiriye û her wiha ev xebata Dionysios bûye maka rêzimana kevneşopî/klasîk jî. Îcar ji ber ku berhema Dionysios li zimanên neteweyên derî cografyaya Ewrûpayê hatiye wergerandin, wekî zimanên ermenî û suryanî û ji

¹ İsmail Yergüz, “İkinci Baskıya Önsöz”, di Süheylâ Bayrav *Yapısal Dilbilimi* de, Multilingual, İstanbul 1998, r. 9-11.

² Süheylâ Bayrav, *Filolojinin Oluşumu*, Multilingual, İstanbul 1998, r. 111.

³ Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim*, C. 1, 4. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2007, r. 18.

⁴ Süheylâ Bayrav, *Filolojinin Oluşumu*, r. 111.

⁵ Steven Roger Fischer, *Dilin Tarihi*, 3. basım, Muhtesim Güvenç (Çev.), Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul 2015, r. 144.

xebatên li ser rêzimanê yê îbranî û erebî re jî bûye rênîşander,⁶ loma mirov dikare bibêje ku vê xebata hanê kartêkerî li xebatên rêzimana zimanên neteweyên nerojavayî kiriye û ji bo wan jî bûye nimûne û çavkanî ku neteweyên din li berê rêzimana xwe şayesandiye.

Ji ber ku lêker yek ji hêmanên girîng ên cureyên bêjeyan tê pejirandin û “yekeya hîmî ya tenebihur a zimên e”⁷, di rêzimanan de xwedî cihekî pir girîng e. Ji ber vê taybetiya hanê, lêker ji gelek aliyan ve bûne mijara lêkolînan û her wisan ew ji gelek aliyan ve jî hatine senifandin. Eger bi awayekî giştî bê gotin, di rêzimanên li ser zaravayê kurmançî de jî ev yek hatiye kirin. Lê belê li ser cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve, nemaze yê ku bi cînavkên lihevxiştî (*jê, lê, pê* û *tê*) pêk hatine, di navbera rêzimannas û amadekarên rêzimanan de yê li ser kurdî/kurmançî, lihevkiyên tam nîn e bê ka ew ji kîjan senifanê ne û her wisan navê wan divê çî be.

Der barê vê mijarê de, ji aliyê me ve yazdeh (11) rêzimanên kurmançî/kurdî hatin vekolan ku tê fikirîn têkiliyê kronolojîk di navbera wan de heye û mirov dikare wan wekî peyrewên hev, mîna nîfşên destpêkê, yê navîn û yê dawî bi nav bike. Her wisan wek pîvan, bandora wan a li axêverên civata zimanî, bikaranîna van berheman di dam û dezgehan de jî, li ber çav hat girtin.

Beriya ku ji vê nakokiyê bê behskirin, ji bo zelalbûna mijarê hewce pê heye ku bi awayekî puxteyî ji lêker û senifana wan bê behskirin, ku ne bi awayekî rasterast be jî, kan û çavkaniya senifanan lêkeran digihîje xebatên destpêkê yê li ser gramerê ku li jorê ji wan bi kurtasî hat behskirin.

1. Lêker û Senifana Lêkeran

Lêker, ku yek ji beşên axaftinê yê bingehîn in, kir û karekî, bûyîn û bizavekê û rewşekê didin zanîn. Di heman demê de ew têgiha kes û demê jî didin xuyakirin.⁸ Wekî ji pênaseyê jî tê fehmkirin, ew hem kar, rûdan û tevgerên heyberan û rewşa wan a ku ew tê de ne radigihînin, hem jî ew çemka kes, dem û darazê jî didin diyarkirin. Ev bêjeyên ku di lînguîstîkê de ji wan re lêkerên gotin, hîmên zimên û hêmana bingehîn a hevokê ne. Her wisan ew hêmanekê girîng a pêveberê ne ku hevok bi wan sergîhayî dibin. Li gel vê, ew maka gelek bêjeyan in û gelek peyv jî ji rayekên wan tên çêkirin. Eger bi taybetî ji aliyê zimanê kurdî ve were gotin, lêker kana dariştina bêjeyên wekî navdêr û rengdêran in. Ew, kan û jêderka çêkirina kirdenavan (îsmê failan) û tiştênavan (îsmê meful) in ku nemaze kirdenav ji rayeka lêkeran, bi piranî ji morfema

⁶ Süheylâ Bayrav, *Yapısal Dilbilim*, Multilingual, İstanbul 1998, r. 30-31.

⁷ Zeynep Korkmaz, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, 3. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2009, r. 527.

⁸ Der barê vê mijarê de ji bo agahiyên zêde *bnr.* Qanatê Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdî (kurmançî-sorani)*, Koral Yayınları, İstanbul 1991, r. 117, Samî Tan, *Rêzimana Kurmançî*, Çapa nûkirî ya 3., Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2015, r. 215, Mehmet Hengirmen, *Türkçe Dilbilgisi*, 8. baskı, Engin Yayın Evi, Ankara 2005, r. 200, Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim*, C. 2, 4. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2007, r. 98.

rayeka dema niha ya lêkeran tên duristkirin. Her wiha, wekî ku tê zanîn, di zimanê kurdî de gava lêker di rewşa xwe ya raderî de ne, di heman demê de navdêr in jî; bi gotineke din ew navdêrên lêkerî ne.

Bi saya lêkeran mirov çendî ji kar, qewimîn, bizav û rewşê haydar dibe jî, lê divê bê diyarkirin ku kategoriyên rêzimanî yên mîna avanî, rawe, dem, kes û mêjer (mîqdar/hejmar) jî, dîsan têkildarî lêkerê ne. Di senifana klasîk a bêjeyan de, lêker hêmana sereke ya xwedî wesfê avakar a bastûra hevokê ango ya sentaksê ye. A ji ber van taybetiyên hanê yên lêkeran, pêwîstî bi nasîna çawanî û wesifên lêkeran jî çêbûye û ji hin aliyan ve ew hatine senifandin.

Lêker, li gorî pîvaneyên wekî teşeya lêkerê, erka (fonksiyona) wê, wate (semantîk) û peywira wê ya ji hêla avaniyê (bîna/voice) ve jî tên vekolan. Lê ji aliyê perspektîfa rêzimana klasîk ve, bi awayekî giştî lêker li sê beşan tên levakirin. Mîna I) Ji aliyê binyatî ve lêker (wekî *lêkerên xwerû*, *lêkerên dariştî* û *lêkerên hevedudanî*), II) ji aliyê avaniyê ve lêker (*lêkerên têper*, *lêkerên teneper*, *lêkerên lebatî*, *lêkerên tebatî*, *lêkerên dançêker*, *lêkerên veşerok* û *lêkerên berbihevîn*) û III) ji aliyê teşeyê ve lêker (*lêkerên rêzikî* û *nerêzikî*).⁹

Ji ber ku mijar ji aliyê binyatî ve lêker û lêkerên veqetînbare¹⁰ ve hatiye sînordarkirin, di vê gotarê de dê li ser her duyên din (ji aliyê avaniyê ve lêker û ji aliyê teşeyê ve lêker) bi awayekî berfirehî neyê rawestandî. Tenê dê qîm bi dayîna hin agahiyên raveker ên der barê wan de bê anîn

Gava lêker ji ber kirde yan jî bireserê wate wergire û bikeve teşeyekê, jê re avanî (bîna/voice) tê gotin. Ji lew re lêker li gorî stendin û nestendina kirde û bireserê jî tên senifandin û ev senifan jî avahîsaziya lêkeran nîşan dide.¹¹ Ji avaniya lêkerê tê zanîn bê ka lêker tekûz an jî kême e. Eger lêker tekûz be, bûyer li kirdeyê, lê ku kême be îcar bûyer li tiştêkî/kesekî din vedigere.¹² Bi vî awayî têperî yan jî teneperiya lêkeran tê zanîn.

Ji ber meseleya kirde û bireserê, avaniya lêkeran li du koman tê dabeşkirin: Wekî avaniya li gorî bireserê û avaniya li gorî kirdeyê. Lêkerên têper û lêkerên teneper di bin jêrnave “avaniya li gorî bireserê” û lêkerên lebatî, lêkerên tebatî,

Ji bo agahiyên zêdetir ên der barê mijarê de *bnr.* Doğan Aksan, *h.b.*, r. 103-105, Mehmet Hengirmen, *h.b.*, r. 200-213, Neşe Atabay, Sevgi Özel & İbrahim Kutluk, *Sözcük Türleri* de, 2. baskı, Papatya Yayıncılık, İstanbul 2003, r. 182- 195, A. Bali, *Kürtçe Dilbilgisi Türkçe Açıklamalı/ Rêzimana Kurdi*, Alan Yayıncılık, İstanbul 1992. r. 171-172.

¹⁰ Ev tîgîha lêkerên veqetînbare ji aliyê me ve wek bergînda tîgîha bi îngilîzî “*separable verbs*” û ya bi almanî “*trennbare verben*”ê hat çêkirin. Lê, ev lêkerên kurmançî, wek nimûne ji zimanê almanî cuda ne. Di dema kêşanê de di zimanê almanî de pêşgir diçe dawiyê, lê yên kurmançî ji hev dibin, hêmanên pêşgirê li esilê xwe vedigerin. Nimûne: *an-kommen* (gihîştin), *Der Zug kommt um 12.30 Uhr in Stuttgart an* (Tren saet di 12.30’yî de digihîje Stûtgartê). Ji bo kurmançî jî minak: *Tê gihîştin; ez di mijarê pir baş gihîştin*. Ji bo zimanê almanî *bnr* Rudolf & Ursula Hoberg, Duden Almanca Gramer, Mihan Çatak (Kurt) & Mehmet Çatak (Çev.), Alfa Yayınları, İstanbul 2003, r. 18.

Bnr. Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim*, r. 103, Mehmet Hengirmen, *Türkçe Dilbilgisi*, r. 202.

¹² Samî Tan, *Rêzimana Kurmançî*, r. 318.

lêkerên dançêker, lêkerên vegerok û lêkerên berbihevîn jî di bin jênavê “avaniya li gorî kirdeyê” de tên bicihkirin.¹³

Ji aliyê teşeyê (formê) ve lêker dibin du bir: Lêkerên rêzîkî û yên nerêzîkî.¹⁴ Li gorî zimanê kurdî lêkerên rêzîkî, ji bilî tewang û ketina deng, ku di rayeka lêkeran de çêdibe, tu guherîn di rayeka wan de çênabe û hemû dem li ser wan rayekan tên kêşan. Qertafên demê û yên lêkera bûnê (gireyên kesane) li wan tên zêdekirin (wekî lêkerên *bûn, çûn, dan, flitîn, gestin, ketin, rabûn, vexwarin* û hwd). Lê lêkerên nerêzîkî ne xwedî vê rêsayê (qaydeyê) ne. Hemû dem li ser heman rayekê nayên kêşan. Ji ber ku rayeka wan a dema niha û ya borî ji hev cuda ne (mîna *anîn, dîtîn, herin* û *werinê*). Lêkerên nerêzîkî wekî du beşan jî dikare bîn senifandin: Wekî lêkerên nerêzîkî yên ku tenê dema niha, dema bê, raweya fermanî, xwestek, daxwazî û hwd. bi wan tên kêşan (wekî ‘*her*’in, ‘*bîn*’in û ‘*bêj*’in) û lêkerên nerêzîkî yên ku tenê demên borî bi wan tên kêşan (mîna *anîn, dîtîn* û *gotin*’ê).

2. Ji Aliyê Binyatî ve Lêker

Lêker wekî çawan ji aliyê teşe, peywir, erk (fonksiyon), wate û avaniyê ve tên senifandin her wisan ji hêla binyatê ve jî tên polînkirin. Binyat (structure), ku têgiheke zimannasiyê ye û her wisan di warê rêzimanê de jî tê bikaranîn, bi awayê cuda tê ravekirin. Wekî “pergala ku ziman û hêmanên di nav ziman de pêk tînin”¹⁵ an jî “pergala ku ji têkiliya di navbera beşên cur bi cur de yên tevahiyekê çêdikin û ji fonksiyona ku ew di nav tevahiyekê de tînin cih, tê pê.”¹⁶ Binyat ku mîna “riayeta li pergala anîna cem hev a tevahiyê”¹⁷ jî tê pênasekirin, îcar gava ji bo rêzimanê ev bêje tê bikaranîn, mebest jê jî amrazên ku bêjeyê pêk tînin (morfem), taybetiyên van keresteyan (yekeyên zimanî), pergala anîna ba hev a van morfeman tê fehmkirin.¹⁸ Ji lew re ji bo vekolîna zimanekî, ji bo têgihîştina bê zimanek çawan dixebite, yekeyên wî zimanî çawan tên cem hev, ji bo şayesandin û ravekirina vê yekê hewce bi peyitandina rêzîkên zimanekî, ango bi binyata wî zimanî heye.¹⁹ Bi kurtî, eger ji bo lêkeran bê gotin, mebest ji binyatê awayê çêbûna lêkerê, pêkhatina wê ya bi morfem û gireyan, pergala wan a hatina cem hev û fonksiyona wan e. Çawan bêje ji aliyê binyatî ve tên vekolan, her wisan bi heman azînê li ser lêkeran jî, ku ew ji cureyên bêjeyan in, tê rawestandî û ew ji van hêlan ve tên nirxandin. Senifandina lêkeran jî ji

¹³ Ji bo agahiyên zêdetir *bnr.* A. Balî, *Kürtçe Dilbilgisi Türkçe Açıklamalı/ Rêzimana Kurdi*, Alan Yayıncılık, İstanbul 1992.

r. 71-72, Mehmet Hengirmen, *Türkçe Dilbilgisi*, r. 2003.

¹⁴ Ji bo agahiyên *bnr.* Kamuran Bedir-Xan, *Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer*, Weşanên Deng, İstanbul 1991, r. 39, A. Balî, *Kürtçe Dilbilgisi Türkçe Açıklamalı/ Rêzimana Kurdi*, r. 172.

Kâmîle İmer, Ahmet Kocaman, A. Sumru Özsoy, *Dilbilim Sözlüğü*, Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi, “Yapı”, İstanbul 2011.

¹⁶ Günay Karaağaç, *Dil Bilimi Terimleri Sözlüğü*, Türk Dil Kurumu Yayınları, “Yapı”, Ankara 2013.

¹⁷ Hüseyin Toptaş, *Türkçe Dersler 1. Kitap*, Papatya Yayıncılık Eğitim, İstanbul 2016, r. 479.

¹⁸ Toptaş, *h.b.*, r. 479.

¹⁹ Emel Huber, *Dilbilime Giriş*, Multilingual, İstanbul 2008, r. 129.

hêla binyatî ve tê kirin, bê ka ew ji çi hêmanan çêbûne, ew xwerû ne, dariştî ne yan jî hevedudanî ne û hwd.

Gava mirov bala xwe dide rêzimanên li ser zaravayê kurmancî, dibîne ku di navbera daner û amadekarên rêzimanên li ser zaravayê kurmancî de ramanekê wan a hevbeş a li ser senifana cureyên lêkeran a ji aliyê binyatî ve, nîn e. Bi rastî ev war, warekî pir kêşedar xuya dike. Ne hejmara cureyên lêkeran a ji aliyê binyatî ve, ne navlêkirina van polînan û ne jî mînakên wan ên ku ji bo senifanan hatine dayîn bi temamî mîna hev in. Wek nimûne; li gorî Kemal Badilli (lêkerên xwerû û yên hevedudanî)²⁰ û Samî Tan (lêkerên xwerû û nexwerû), didu ne.²¹ Li gorî Celadet Bedîrxan û Roger Lescot (lêkerên xwerû, hevedudanî û yên biwêjî)²², A. Balî (lêkerên xwerû, hevedudanî û yên alîkar)²³, Halîl Altug (lêkerên xwerû, pêkhatî û pevedanî)²⁴ û Bahoz Baran jî (lêkerên xwerû, dariştî û yên hevedudanî)²⁵, sisê ne. Anegorî Kamûran Bedîrxan (lêkerên alîkar, lêkerên xwerû, lêkerên hevedudanî û lêkerên biwêjî)²⁶, Qanatê Kurdo (fêlên kokanî, fêlên efrînok, fêlên bargirani/lêkdiraw û fêlên ardîmiyê)²⁷, Feqî Huseyn Sagnîç (lêkerên binyatî, lêkerên çêkirî, lêkerên qertaf û lêkerên hevedudanî)²⁸, Mûrad Ciwan (lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, lêkerên hevedudanî û yên biwêjî)²⁹ û Kadri Yıldırım (lêkerên xwerû, yên dariştî, yên hevedudanî û yên biwêjî)³⁰ di kurmancî de ji aliyê binyatî ve çar cure lêker hene. Bi gotina puxteyî, li gorî van daner û amadekarên rêzimanê, di zaravayê kurmancî de ji aliyê binyatî ve şeş cure lêker hene: Lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, lêkerên hevedudanî, lêkerên alîkar, lêkerên biwêjî û lêkerên qertaf. Wekî dixuye, der barê vê mijarê de nikare ji ramanekê hevpar bê behskirin.

Ji bo ku nîrxandineke bijûndar der barê senfina cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve bê kirin, hewce bi pênaseya van cure lêkeran heye. Bi alîkariya ronîya van terfîa di mirov bikare xwe bigihîne encameke hîn rasttir û qebûlbar.

Serê pêşî ku ji lêkerên xwerû bê destpêkirin, ji bo pêdeçûna bi mijarê ve dê sanahîtir be. Lêkerên xwerû (sade), cure lêker in ku ew bi serê xwe ne, ne bi alîkariya gireyên (qertafên) dariştinê ne jî bi riya hêmanên zimên hatine çêkirin. Bi gotineke hîn aşkeratir, ew lêkerên eslî ne ku ji yek bêjeyê pêk hatine û di

²⁰ Kemal Badilli, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)*, Med Yayınları, İstanbul 1992, r. 102.

²¹ Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 230.

²² Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, *h.b.*, r. 119.

²³ A. Balî, *Kürtçe Dilbilgisi Türkçe Açıklamalı/ Rêzimana Kurdi*, r. 171.

²⁴ Halil Altug, *Gramera Kurdi (Kürtçe Gramer)*, Avesta, İstanbul 2013, r. 404

²⁵ Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, Belkî, İstanbul 2012, r. 171-174.

²⁶ Kamuran Ali Bedir-Xan, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri*, Weşanên Deng, İstanbul 1991, r. 47., r. 39.

²⁷ Qanatê Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdi (kurmancî-sorani)*, Koral Yayınları, İstanbul 1991, r. 117-182. Navên di nav kevanekê de ji hêla me ve hatine danîn

²⁸ Feqî Huseyn Sağnîç, *Hêmana Rêzimanê Kurdi*, Melsa Yayınları, İstanbul 1991, r. 94.

²⁹ Mûrad Ciwan, *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanc Lehçesi)*, Weşanên Jîna Nû, Balinge 1992., r. 81.

Kadri Yıldırım, *Temel Aştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilgisi (Kurmancî Lehçesi)*, 2. baskı, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul 2012., r. 40.

rewşa rayekê de ne³¹ ku li yekeyên watedar nayên parevekirin. Wekî van lêkeran: *ajotin, bihistin, bûn, cûtin, çûn, dirûtin, firotin/firoştin, girtin, hiştin, jendin, kirin, leyîstin/lîstin, malaştin, nivîstin, nixamtin, parastin, qelaştin, rêtin, spartin, şûştin, vêtin, xistin, xwarin, zivartin...*

Lêkerên dariştî, wekî ji nav jî dixuye ew bi gireyan hatine dariştin, ji hêmaneke tenê çênebûne û ne bi tena serê xwe ne. Ew an ji lêkerê xwerû yan jî ji cureyekî peyvê hatine piraştin.³² Divê bê gotin ku di kurmancî de lêkerên dariştî bi pêşgir û paşgir çêdibin û her wisan, ji lêkerên dariştî yê bi paşgir cardin bi alîkariya pêşgir lêkerên nû yê dariştî tên duristkirin. Wekî van lêkerên nimûneyî: *Bezîn, bezandin, germijîn, germijandin, beliqîn, beliqandin, helisîn, helisandin, germixîn, germixandin* (ev bi paşgir çêbûne), *berdan, dadan, derketin, hilbûn, radan, rûniştin/rokirin, vexwarin, vêsandin û wergirtin* (bi pêşgir çêbûne³³), *dagerandin, hilgerandin, veqerandin, wergerandin* (ev jî cardin bi alîkariya pêşgir ji lêkerên dariştî yê bi paşgir hatine piraştin).

Mijara lêkerên hevedudanî (lêkdayî), mijareke zêde xwedî kêşe ye, hem der barê pênaseya wan de, hem jî der barê senifana wan de, di navbera zimannas, daner û amadekarên rêzimana kurmancî de lihevkerin nîn e. Li gorî hinekan ew cure lêkerên wisan in ku bi alîkariya lêkerên alîkar û ji bêjeyê ji esilê navdêran çêdibin.³⁴ Di gel vê yekê, kesên ku berevajiyê vê pênaseyê nêzikahî di terîfa lêkerên hevedudanî didin jî hene. Wek nimûne, li gorî Qanatê Kurdo, lêkerên hevedudanî ji navên heyînê, ji rengdêran, ji pêşgir û paşgir û ji lêkerên xwerû û yê dariştî pêk tên.³⁵ Kamûran Bedîrxan li ser lêkerên hevedudanî dadixuyîne ku lêkerên hevedudanî du cure ne; yek jê bi pêşgirek û lêkerê xwerû ya din jî ji rengdêrek an jî ji navdêrekê û ji lêkerê xwerû pêk tê.³⁶ Li vir mebest ji pêşgirê jî ew pêşgir in ku bi wan ji lêkerên xwerû lêkerên dariştî tên çêkirin. Ramana Rojan Barnas a der barê lêkerên hevedudanî de jî wiha ye: "... *gewda lêkerê bi pîranî ji lêkerê û ji pêrkîteke xwerû an ji pêrkîteke hevedudanî, ji navdêrekê, ji rengdêrekê, an ji hokerekê pêk tê.*"³⁷ Wekî ji van kurtedaxuyanan jî aşkera dibe, ramaneke hevpar a li ser pênaseya lêkerên hevedudanî nîn e. Ne tenê di navbera rêzimannasên kurd de, di navbera yê tirk de jî der barê

³¹ Der barê mijarê de ji bo agahiyên hîn berfireh *bnr.* Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 230, Mûrad Ciwan,

Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi), r. 81, A. Bali, *h.b.*, r. 172, Hanîfî Vural & Tuncay Böler, *Ses ve Şekil Bilgisi*, Kesit Yayınları, İstanbul 2014, r. 207.

³² *Bnr.* Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 257, Qanatê Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdi (kurmancî-sorani)*, r. 129.

Halê hazîr *da-, der-, hil-, ra-, rû/ro-, ve-, vê-* û *wer-* ên di zimanê kurdî de wek pêşgirên piraştinê tên qebûlkerin û der barê binyata wan te tiştêkî vebir/esehî nîn e.

³⁴ *Bnr.* Celadet Ali Bedîr Han & Roger Lescot, *Kürtçe Gramer*, 2. Baskî (Wergera ji Fransî: li jêr çavdêriya Enstîtuya Kurdî ya Parisê), Avesta, İstanbul 2004, r. 182, Mûrad Ciwan, *Temel Alisturma ve Metinlerle Kürtçe Dilgisi (Kurmancî Lehçesi)*, r. 88.

³⁵ Qanatê Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdi (kurmancî-sorani)*, r. 151.

³⁶ Kamuran Ali Bedîr-Xan, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri*, r. 47.

³⁷ Rojan Barnas, "Lêkerên Hevedudanî", *Kurmancî*, h. 5, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parisê, Paris 1989, r. 2.

pênaseya lêkerên hevedudanî de gelşeke wiha heye. Yên ku pênaseya lêkerên hevedudanî bi awayê "...ew cure lêker in ku ji navdêrek û ji lêkerekê alîkar an ji du şekilên cuda yê lêkeran an jî ji peyvek an ji yekê zêde ya ji bêjeyên esilê navdêrê û ji lêkerekê eslî bi hev dikevin"³⁸, jî dikin hene. Lê li gorî Ferhenga Tirkî ya Saziya Zimanê Tirkî, lêkera hevedudanî wek "ew lêker e ku ji hêla teşe û wateyê ve bi bêjeyê ji esilê navdêrê ve bi yek bûye"³⁹ tê kirin.

Wekî dixuye, der barê pênaseya lêkerên hevedudanî de raman û nêrînên ku hev nagirin hene. Loma, bi ya me qet nebe ji bo lêkerên hevedudanî yê zaravayê kurmançî hewce bi pênaseyê hevpar heye. Gava ji pênaseyên jorê jî sîd bê wergirtin, mirov dikare terîfeke wiha bike: Lêkerên hevedudanî hem bi alîkariya lêkerên alîkar û bêjeyê ji esilê navdêran (wekî navdêrek, rengdêrek an jî hokerekê), hem jî bi çend cureyên bêjeyan (mîna daçek û bêjeyê ji esilê navdêrê) û ji lêkerekê alîkar çêdibin (ji bo vê yekê çend mînak; *av dan, sond xwarin, reş bûn, mitane bûn, li hev ketin, bi serî kirin, bi ser de girtin*). Îcar bêjeya ji esilê navdêran dibe ku xwerû, dariştî yan jî hevedudanî be, her wiha lêkera alîkar jî dibe ku xwerû yan jî dariştî be. Li hêla din, li gorî zaravayê kurmançî, rêza bêjeyan a ku bi wan lêkerên hevedudanî pêk tê, bi temamî ne wisan e ku divê lêkera alîkar bê dawiyê. Awarte ev e ku di hin lêkerên hevedudanî de, li derî rêza bêjeyan a gelemper, lêkera alîkar tê destpêkê û bêjeyê ji esilê navdêrê tê dawiyê. Wekî lêkera hevedudanî ya "*çûn ava*"yê (ku rewşa kêşayî bi vê şeweyê "*roj çûbû ava*" çêdibe). Di encamê de lêkera hevedudanî, komeka bêjeyê ye û hemû hêmanên wê divê ji cureyekî bêjeyê bin. A hîmî ew e ku ji aliyê wateyê ve tevahiyekê pêk bîne û di hevokê de jî kirariya bêjeyê bîne cih. Her wiha divê ku her lêkerekê hevedudanî, tenê têgihekê derbibe.⁴⁰ Cudahiya van lêkeran ji lêkerên dariştî ew e ku di pêkhatina wan de gire (qertaf) nîn in û ew tenê ji cureyên bêjeyan çêdibin. Çend mînak ji bo lêkerên hevedudanî: *av dan, baş bûn, cih girtin, dest vegirtin, gef xwarin, pirs kirin, kêfxweş bûn, bêcan bûn, bihiş bûn, dabor bûn, derpêş kirin, nexweş ketin, raçav kirin, verê kirin, werbêj kirin, dostanî kirin, deyndar bûn, şermezar bûn, dehfîk vedan, şermî kirin, çepeve bûn, berevajî bûn, çaverê kirin, qijewîj kirin, beranber man, paşopê bûn, bextbireş bûn, bêserûber bûn, birêkûpêk kirin, bi hev ketin, bi serî kirin, di ber dan, ji bîr kirin, li êk dan, li hev asê bûn, bi ser de girtin, ji bîr ve çûn, jev çûn, jêk bûn, lêk dan, pev ketin, pêk hatin, tev dan, têk çûn...*

Ji bo "lêkerên biwêjî" tê gotin ku ew "ji gelek hêmanên ku ne lêker in (daçek, pêşdaçek, paşdaçek, cînavk, rengdêr, navdar) û ji hêmana lêkerekê sade yan jî ji

³⁸ Hanifi Vural & Tuncay Böler, *Ses ve Şekil Bilgisi*, r. 244.

³⁹ Türkçe Sözlük, "Birleşik fiil", *Türk Dil Kurumu Yayınları*, 11. baskı, Ankara 2011.

⁴⁰ Necmettin Hacıeminoğlu, *Türk Dilinde Yapı Bakımından Fiiller*, Bilge Kültür Sanat, İstanbul 2016, r. 299.

ya hevedudanî pêk tîn.”⁴¹ An jî “ew ji lêkerê û ji çend hêmanên nelêkerî tîn himatê.”⁴² A rast ev pênase, hema yekser lêkerên hevedudanî tîne bîra mirov. Loma tebîra “lêkera biwêjî”, ji bo vê polînê bi ya me ne çemkeke rast e. Ji ber ku bi gotina “biwêjî”ê, bal li wateya lêkerê tê kêşan û ew ji aliyê semantîk ve rewşa lêkerê derdibe. Li aliyê din, lêkerên ku ji bêjeyeke esilê navdêrê û ji lêkerê pêk hatine jî, dikarin bikevin nav kategoriya wateya biwêjî. Mîna “sor bûn”ê, ku ne bi wateya reng, lê bi wateya rewşa ji ber şermê ye. Dîsan lêkera “bi serî kirin”ê, ku ne bi mehneya tijebûna heta ber dev a derdanekê, lê bi wateya “zewicandin”ê ye. Ji van ravekirinan, bi awayekî pir zelal diyar dibe ku divê ew û lêkerên hevedudanî ji aliyê binyatî ve, ji hev cihê bin. Loma senifana bi navê “lêkerên biwêjî” senifanê wateyî ye ku êdî ew ne di wateya xwe ya rast de lê bi wateyeke din e û ew nabe senifanê lêkeran a ji aliyê binyatî ye. Eger wek dubare bê gotin; lêkerên biwêjî ne kategoriyeke lêkeran a ji aliyê binyatî ve ye, ew kategoriyeke semantîk e. Jixwe gava ku ji hêla wateyî ve li ser lêkeran bê rawestandî; a bi awayê wateya rast, a bi wateya layekî û ya bi wateya mecazî, ew dibe nêzîktêdanê semantîk a lêkeran. Bi ya me, ew lêkerên ku ji wan re lêkerên biwêjî tê gotin, ji aliyê binyatî ve ew ji cureyên lêkerên hevedudanî ne ku bi daçekan çêbûne û ji lew re ji wan re lêkerên hevedudanî yên bidaçek⁴³ û kombêjeyên lêkerî⁴⁴ jî tê gotin. Eger di bin navê lêkerên hevedudanî de polînek bê çêkirin dikare navê lêkerên hevedudanî yên kompleks jî li hinekên binbeşên vê senifanê bê kirin. Wekî bi ser de girtin, bi ser ve bûn, bi ber ketin...

Di bin ronîya xebatên teorîk ên eleqedarî mijarê û li gorî pênaseya binyatî ku têkildarî awayê çêbûn û pêkhatina lêkeran e nabe ku lêkerên alîkar, wek cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve rast bê pejirandin. Ji lew re lêkerên alîkar, di pêkhatina lêkerên hevedudanî de bi rola alîkariyê radibin û bi saya wan bêjeyeke ji esilê navdêrê tê kêşan. Loma ji hêla binyatî ve lêkera alîkar ne cureyeke lêkerê ye.

Her wisan “lêkerên qertaf” jî ku mebest jê gireyên kesane ne (*im, î/yî, e/ye, in, in, in; me, yî, ye, ne, ne, ne*), ew nakeve nav senifana ji aliyê binyatî ve ya cureyên lêkeran. Ev, gire kesan/tiştan dinimînin û bi saya wan hem pirhejmarî û yekhejmarî hem jî rêza kesan/tiştan tê zanîn û naskirin. Loma eleqeya wan bi cureyên lêkeran a ji aliyê binyatî ve nîn e. Wek nav her siyên din (lêkerên xwerû, dariştî û hevedudanî) bi ya me rast in. Liv an ên hane ji aliyê me ve, bi

⁴¹ *Bnr.* Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, *Kürtçe Gramer*, r. 190, Mûrad Ciwan, *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi (Kurmancî Lehçesi)*, r. 86, Kadri Yıldırım, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilgisi (Kurmancî Lehçesi)*, r. 42.

⁴² Rojan Barnas, “*Lêkerên Hevedudanî*”, r. 2.

⁴³ Bi zimanê îngilîzî ji wan re “phrasal verbs” tê gotin û ew di nav lêkerên hevedudanî de cih digirin ku ji du yan jî sê bêjeyan pêk tîn. Wek minak; “to look out” (diqat kirin), “to keep on” (dewam kirin, domandin).

⁴⁴ Kamiran Bêkes, *Bingehên rêzimana kurdi/zaravê kurmanciya bakur*, Weşanxane?, Osnabrück 2004, r. 211.

navê “lêkerên veqetînbar” cureyeke din li wan tê zêdekirin. Bi vî awayî li gorî ramana me di zaravayê kurmancî de wekî lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, lêkerên hevedudanî û lêkerên veqetînbar, ji aliyê binyatî ve çar cure lêker hene.

3. Lêkerên Veqetînbar

Divê di serî de bê aşkerakirin ku ne di rêzimanê li ser zaravê kurmancî de ne jî di gotarekê eleqedarî vî warî de çemkeke bi navê “lêkerên veqetînbar” tune ye. Ev nav û senifan bi tamamî aîdî me ye. Mebesta ji gotina lêkerên veqetînbar jî ew e ku ev lêkerên kurmancî di dema kêşanê de ji hev dibin û hem ji aliyê bastûrî (binyatî) ve hem jî ji aliyê kêşanê ve, ji yê din cuda dibin.⁴⁵ Ev lêkerên ku di wexta kêşanê de cînavka wan a lihevxiştî ji hev dibe û bireser⁴⁶ dikeve navbera daçek û lêkerê, ku bi şeweyeke gelemper bê gotin, xwedî du awayan in. Koma pêşî ji cînavkeke lihevxiştî û ji lêkerekê (wekî *tê gihîştin* û *pê ketinê*) yan ji cînavkeke lihevxiştî, ji paşdaçek û lêkerekê (*mîna pê de çûn* û *tê de kirinê*), yan jî ji bêjeyeke esilê navdêrê, ji cînavkeke lihevxiştî û ji lêkerekê (wekî *dest pê kirin* û *dev jê berdanê*) çêdibin. Koma duyem jî ji bêjeyeke ji esilê navdêrê, ji hêmanêke rêzimanî/morfosentaktîk /-a/yê yan jî ji /-î/yê û ji lêkerekê tên pê (*mînak; hînî...kirin* û *kêfa...anîn*). Taybetiya lêkerên ji koma pêşî ew e ku di dema kêşanê de hêmanên cînavkên lihevxiştî (*jê, lê, pê û tê*) li esilê xwe vedigerin û bireser dikeve navbera daçek û lêkerê. Rewşa lêkerên ku /-a/ an jî /-î/ bi dawiya bêjeyeke ji esilê navdêrê ve dizeliqê wekî hev e û dîsan bireser dikeve navbera wan û lêkera alîkar. A ji ber vê yekê navê lêkerên veqetînbar ji aliyê me ve ji bo wan cure lêkeran guncan hat dîtin ku di dema kêşanê de ne lêkerên xwerû ne lêkerên dariştî ne jî lêkerên hevedudanî dikevin rewşa wan.

Di xebatên rêzimanên li ser zaravayê kurmancî de, ev cure lêkerên ku ji aliyê me ve wek lêkerên veqetînbar tên binavkirin, ji hêla binyatî ve wek kategoriyeke serbixwe ya cureyên lêkeran nehatine senifandin. Tenê behs ji lêkerên ku bi cînavkên lihevxiştî (*mîna lê xistin, pê ketin, jê kirin, tê dan, tê werdan, jê hez kirin* û *dest pê kirin* 'ê) û yê ku bi morfema /-î/yê çêbûne, hatiye kirin.

Di van berheman de, lêkerên ku ji aliyê me ve wek lêkerên veqetînbar tên pênasekirin, ku di wan de cînavkên li hevxiştî hene, di bin sernavên cuda de hatine senifandin. Beriya ku bê kî bi çi çavî li van cure lêkeran dinêre bê aşkerakirin, divê em bidin xuyakirin ku ji bo mijar zêde dirêj nebe û ji armanca xwe averê nebe, dê tenê di nav kevanekê de qîm bi dayîna çend nimûneyan bê anîn. Li gorî Celadet Bedirhan û Roger Lescot (*lê xistin, pê ketin, jê kirin*)⁴⁷, Qanatê Kurdo (*lê dan, çav pê ketin, jê pirsin, pê ketin, dest pê kirin, tê dan*)⁴⁸,

⁴⁵ Ev lêkerên kurmancî, çawan ku berê jî di dipnota 10'an de hat aşkerakirin, wekî yê zimanê almanî pêşgira wan di dema kêşanê de naçe dawiyê.

Bireser/tiştê dibe ku yekser an jî ne yekser be. Ji niha pê ve ji bo hêsaniya serwestbûna ji mijarê dê tenê bêjeya bireser (an jî tiştê) bê bikaranîn.

⁴⁷ Celadet Ali Bedir Han & Roger Lescot, *h.b.*, r. 183.

⁴⁸ Qanatê Kurdo, *Gramera Zmanê Kurdi (kurmanci-sorani)*, r. 168-175.

Kemal Badilli (*jê ketin, lê ketin, pê ketin, tê ketin*)⁴⁹, A. Balî (*jê kirin, tê dan, lê dan, pê xistin*)⁵⁰, Halîl Altug (*lê ketin, pê vedan, jê kirin, lê xistin*)⁵¹ û Bahoz Baran (*lê kirin, jê kirin, pê ketin*)⁵² ew lêkerên hevedudanî ne, lê li gorî Kamûran Bedirxan (*lê ketin, lê xistin, dest pê kirin, ser jê kirin*)⁵³, Mûrad Ciwan (*pê xistin, jê hatin, tê xistin, pê de kirin, tê de kirin*)⁵⁴ û Kadri Yildirim (*lê çûn, jê kirin, pê ve kirin*)⁵⁵ ew lêkerên biwêjî ne û li gorî Samî Tan (*tê dan, pê de çûn, jê kirin, tê hilhatin, lê kirin, pê ve kirin*)⁵⁶ jî ew “lêkerên bidaçek” in. Li hêla din, divê bê aşkerakirin ku di xebata rêzimana Feqî Huseyn de ji van cure lêkeran behs nehatiye kirin.

Îcar ji her du yên din, ên ku bi /-a/ û /-î/yê çêdibin, em tenê lê rast hatin ku ji aliyê Kamûran Bedirxan ve bal li ser morfema /-î/yê ya ku tê dawîya bêjeyê (*mîna rastî... hatin û hînî...kirin*) hatiye kêşan û ev cure lêker jî ji hêla wî ve wek lêkerên hevedudanî hatine binavkirin.⁵⁷ Lê bi ya me ev jî lêkerên veqetînbar in ku di wan de jî bireser dikeve navbera bêje û lêkerê.

Ji ber lêkerên veqetînbar ên bi alîkariya cînavkên lihevxiştî çêbûne, di dema kêşanê de bi awayekî giştî cînavkên lihevxiştî wekî xwe namînin û li beşên xwe yên eslî dadigerin, loma nabe ji bo wan ev navên li jorê bînan bikaranîn. Eger bi dorê li ser van navlêkirinan bê sekinandin; bi ya me pênaseya “lêkerên hevedudanî” ji bo van lêkeran ne navekî guncan e. Ji lew re di wexta kêşana deman a lêkerên hevedudanî de, di binyata bêjeya ji esilê navdêrê de (çi xwerû, çi dariştî, çi jî kompleks be) tu guherînek pêk nayê. Ji aliyê pênaseya lêkerên hevedudanî ve, çendî bişibe wan jî ku tê gotin herî hindik ew ji du hêmanan pêk tên, lê di wextê kêşana deman de ji wan cudatir in. Her wisan tebîra “lêkerên biwêjî” jî wan nanimîne (temsîl nake). Têgiha biwêjî jî, ji aliyê wateya lêkeran ve kategoriyeke e. Loma ji vî aliyê ve gava li mijarê bê nihartin, çawan hin lêkerên hevedudanî di heman demê de awayên wan ên biwêjî hene, hin lêkerên veqetînbar ên bi cînavkên lihevxiştî hatine dariştin jî, awayên wan ên biwêjî hene. Navlêkirina “lêkerên bidaçek” jî wek navekî somdar (şimûl) hemûyan li xwe nagire. Wekî mînakên “*bi serî kirin, di ber dan, ji ber xwe kirin, li hev xistin, li ber xwe dan*”ê, ku îcar di van de cînavkên lihevxiştî nîn in. Eger bi kurtasî bê gotin; hem di lêkerên xwerû û dariştî de hem jî di yên hevedudanî de, ji bilî lêkera alîkar tu guherîn di hêmanên din de çênabin. Tu hêmaneke beşên ku lêker pê çêbûne, di wextê kêşana deman de ji hev venaqete û bireser jî nakeve navbera daçek û lêkerê. Ji lew re hewce ye ev cure lêker ji aliyê bastûrî ve ji yên

⁴⁹ Kemal Badilli, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)*, r. 112.

⁵⁰ A. Bali, *Kürtçe Dilbilgisi Türkçe Açıklamalı/ Rêzimana Kurdi*, r. 178-179.

⁵¹ Halil Altug, *Gramera Kurdî (Kürtçe Gramer)*, r. 418-420.

⁵² Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, r. 173.

⁵³ Kamuran Ali Bedir-Xan, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri*, r. 48-49.

⁵⁴ Mûrad Ciwan, *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi (Kürmanç Lehçesi)*, r. 86-88.

⁵⁵ Kadri Yildirim, *Temel Aştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilgisi (Kürmanç Lehçesi)*, r. 42-43.

⁵⁶ Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, r. 266.

⁵⁷ Kamuran Ali Bedir-Xan, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri*, r. 48.

din bèn veqetandin û bi navekî din bèn binavkirin ku mesele ne ew e bê ew ji çend hêmanan hatine pê. Lê mesele xwe di rewşa wan a di dema kêşanê de dide der.

Ji ber ku ev cure lêker ji aliyê binyatî ve xwedî taybetmendiyekê ne, bi ya me, ev cudahî bi xwe dihêle ku ew di bin navekî serbixwe de bèn senifandin. Her wisan divê bê aşkerakirin ku bi saya cînavkên lihevxiştî ji lêkeran, lêkerên din tèn piraştin. Ev cînavkên lihevxiştî di pêkhatina lêkeran de jî bi rola pêşgiran radibin, loma ew êdî dibin xwedî kategoriyeke din a ji aliyê binyatî ya cureyên lêkeran ve. A ev cure lêker, angî lêkerên veqetînbar, ji ber sedama ku ew xwedî şeweyên ji hev cihê ne, divê di bin sernavên cuda de bèn polinkirin û bi jêrbeşan jî dirêjî bi wesifê/çawaniya wan bê dan.

4. Senifana Lêkerên Veqetînbar

Lêkerên ku ji aliyê me ve wek lêkerên veqetînbar tèn binavkirin, di bin navên du koman de dikare bèn senifandin. Wekî lêkerên ku bi cînavkeke lihevxiştî û lêkerekê û yên ku bi morfema /-a/ an jî /-î/yê çêdibin, ku ew jî tèn dawiya bêjeyeke ji eslê navdêran.

4.1. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkên Lihevxiştî

Beriya têketina nav mijarê û derpêşkirina nimûneyên der barê van cure lêkeran de, divê bê daxuyandîna ku cînavkên lihevxiştî, wekî ji nav jî dixuye, ne sade ne, ew ji daçekek û cînavkekê hatine pê. Bi domana demê re, ji ber sedemên cuda bi ser hev de hatine, quncivîne ser hev û ketine vê rewşê. Di zaravayê kurmancî de ev cînavkên lihevxiştî du tof in. Tofa yekem ji *jê, lê, pê* û *tê* û tofa duyemîn jî, ji *jev/jêk, lev/lêk, pev/pêk, tev/têk'ê* pêk tê. Lê ji ber ku koma pêşî eleqedarî mijarê ye, bi kurtasî be jî rawestandina li ser wan, ji bo zelaliya mijarê pêwîst dike. Lê di gel vê yekê, divê bê gotin ku cînavkên lihevxiştî yên tofa duyem jî ne sade ne û ew jî ji daçek û cînavka “hev” û ya “êk”ê çêbûne. Cudahiya van ji yên din ew e ku di dema kêşanê de dibê ku ew ji hev venebin. Bi gotina din, ew hem dikarin bi forma kurt hem jî bi ya dirêj bèn kêşan; lê çend awarte ne tê de (wekî *pev çûn, tev gerîn, pêk hatin* û *têk çûnê*, ku êdî di dema kêşanê de ji hev venabin). Biresera wan jî cînavka wan (hev, êk) e.

Cînavkên ji tofa yekem ku ew bi rola pêşgiran jî radibin, ev in û ji van hêmanan hatine pê:

Jê: Ji daçeka /ji/yê û ji cînavka kesane yan jî ji ya îşarkî /wî/, /vî/ an jî /wê/, /vê/’yê,

lê: Ji daçeka /li/yê û ji cînavka kesane yan jî yan ji ya îşarkî /wî/, /vî/ an jî /wê/, /vê/’yê,

pê: Ji daçeka /bi/yê û ji cînavka kesane yan jî ji ya îşarkî /wî/, /vî/ an jî /wê/, /vê/’yê,

tê: Ji daçeka /di/ye û ji cînavka kesane yan jî ji ya îşarkî /wî/, /vî/ an jî /wê/, /vê/ çêbûye ku ev hemû ji ber rewşa quncivînê bi ser hev de hatine û ketine vê rewşê.

Lêkerên ji cînavkeke lihevxiştî û ji lêkereke alîkar têne pê, di dema kêşanê de ev cînavkên lihevxiştî, bi awayekî gelemper li hêmanên xwe yên ku ew bi wan çêbûne, dadigerin. Lê carinan jî bi ser hev de tên û dikevin rewşa xwe ya quncaftî. Gava di rewşa xwe ya quncaftî de ne, her ji bo cînavka kesê sêyemîn ê yekhejmar in an jî ji bo cînavkeke yekhejmar a îşarkî ne. Di van lêkerên de, lêkera alîkar jî dibe ku xwerû yan jî dariştî be. Loma dê senifana wan ji aliyê bastûra lêkera alîkar ve bê kirin.

4.1.1. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkereke Xwerû

Ev lêker, di rastiya xwe de ji daçekê, ji cînavkê û ji lêkereke xwerû pêk tînin; wekî *jê çûn*, *jê hatin*, *jê ketin*, *jê xwarin*, *lê dan*, *lê kirin*, *pê ketin*, *pê kirin*, *tê dan* û *tê gihîştin*. Bi dayîna çend hevokên nimûneyî, dê guherîna ku di dema kêşanê de di van cure lêkeran de pêk tê, were nîşandan:

jê xwarin: *Wî gelek **ji kurê** xelkê **xwariye**.*

jê çûn: *Di leyistikê de pir pere **ji Azad** ê qurmarbaz **çûbû**.*

lê kirin: *Were avê **li destê min bike**.*

lê dan: *Ew pir xweş **li sazê dide** ku mirov jê re hejmetkar dimîne.*

pê ketin: *Ew gişt **bi xwarina** nivistî **ketibûn**.*

pê kirin: *Destê xwe hat **bi min** ê reben **kir**.*

tê dan: *Rûn **di nanê** kartû **dabû** û dixwar.*

tê ketin: *Tu **di hundirê** vê malê **nakevî**.*

Rêzik û qanûna giştî ya ji bo van lêkerên hanê wiha ye: Di wexta kêşanê de hêmanên cînavkên lihevxiştî ji hev vediqetin û tişte (bireser) dikeve navbera daçek û lêkera alîkar. Lê bi qonaxa demê re, averêbûnek di vê rêzika giştî de çêbûye û awayekî din a bikaranîna van lêkeran qewimiye. Mîna lêkerên *lê kirin* (bi wateya “ava kirin”ê), *jê kirin* (bi mehneya “birîn”ê), *pê xistin* (bi wateya “dadan”a agir); her wisan bêyî ku wateyeke din ji wan biçe, mîna lêkerên *tê ketin*, *tê kirin*, *lê dan* û *lê xistin*ê. Wek nimûne: *Min xanî **lê kir***, *tiliya xwe **jê kiribû***, *agir **pê bixe** ez xwe germ bikim*, *sazêke xweş **lê dide/dixe***, *paxav nekir **tê ket** govendê*, *sola xwe **tê kiriye** piyê xwe*.

Di van hevokên nimûneyî de, wekî tê dîtin cînavkên lihevxiştî wek xwe mane, ango ew li hêmanên xwe yên hîmî danegeriyane. Ev cudabûneke ji rêzika giştî ya van cure lêkeran e ku rêjeya wan gelek hindik e. Di gel vê rewşê, di devokên wekî hêla Qerejdax, Riha û Semsûrê de qaydeyê gelemper hîn zindî ye û li şûna awayê gotina “*tê keve hundir*”, forma “*di hundir keve*”⁵⁸, li cihê “*Dikin ku tê bikevin bin piştîyên xwe...*” şeweya “*Dûre dikin di bin piştîyên xwe kevin û*

⁵⁸ Mustafa Gazî, *Ferheng Kurdî-Tirkî*, “Têketin”, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2006.

*herin malê...*⁵⁹ tên bikaranîn. Ji bo awayên bikaranînên ji hev cuda yên lêkerên wekî “*lê kirin*”, “*pê xistin*”, “*tê ketin*” û “*tê kirin*”ê, çend hevokên nimûneyî dikare bi hêsanî ji wêjeya devkî yanê ji zargotina kurdî ya kurmancî were derpêşkirin da ku ev cihêti berbiçavtir bibe:⁶⁰ “*Siwar hin bi hin nêzikayî li malê dîkin*”⁶¹, “*Agir bi xan û manê xwe t’ev xistîye*”, “*Ez û tu, emê têk’evine kêf û h’enekê di dinê ye*”⁶², “*Lawo ar di mala we keve*”⁶³, “*Ezê milê xwe ter’a têkim p’er’r û bask e.*”⁶⁴, “*Min serê Kêço di te kirê*”.⁶⁵

Qaydeyê giştî yên kêşana van lêkerên hanê, ji bilî çend lêkerên mîna yên ku li jorê ji wan hat behskirin, wisan e ku di gava kêşana deman de hêmanên cînavkên lihevxiştî ji hev dibin û tişte dikeve navbera daçek û lêkerê.

4.1.2. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkerêke Dariştî

Lêkerên ji vê komê, ji cînavkeke lihevxiştî û ji lêkerêke dariştî pêk tînin. Têperî û tîneperiya van lêkeran jî dîsan ji lêkerê diyar dibe. Cudahiya van jî ya xala berî vê, tenê ew e ku lêkerên wan ên dariştî ne. Ji bo vê binbeşê çend hevokên mînak:

jê hîlanîn: Tehm ji gotina çîroka xwe hildianî û welê didomand.

lê rabûn: Şênî tev li wan bêkesan rabûbûn.

lê vegerandin: Min kitêb gişt li wan cîrnexweşan vegerandin.

pê vedan: Mar bi binê piyê wî camêrî vedabû.

pê werkirin: Wê îsot bi xwarinê ku tehma wê ne xweş bû, werkir.

tê derxistin: Wî bi tîkiliya di navbera wan derxist.

tê hildan: Nanên xwe di rîçala miz hildidan û dixwarin.

4.1.3. Lêkerên Veqetînbar ên bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkerêke Hevedudanî

Cihêtiya van lêkeran jî yên din jî ber lêkera alîkar a hevedudanî ye. Her wiha bêjeya beriya lêkerê jî dibe ku navdêreke hevedudanî be. Ji bo mijara van cure lêkeran, tişteki girîng jî heye ku divê bê diyarkirin û dêhn lê bê kêşandin, kêmbûna rêjeya wan e. Di dema kêşanê de gava ew ji hev dibin, cînavka wan a

⁵⁹ Zekî Akdag, *Çîrokên Gelêrî yên Kurdan (Herêma Semsûr û Ruhayê)*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2016, r. 53.

⁶⁰ Dest li rastnivîsîna hevokên nimûneyî nehatiye gerandin û ew wek awayê jêgiranê hatine hiştin.

⁶¹ Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda I*, çapa 3., Aram Yayinevi, Amed 2013, r. 86.

⁶² *Celîl, h. b.* r. 69.

⁶³ Mahpus Bilîz, “Kêço” *Folklorê Kurdan*, h. 3, Weşana Şaredariya Bajare Mezîna Amedê, İstanbul 2015, r. 47-55.

⁶⁴ Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda*, r. 364.

⁶⁵ Mahpus Bilîz, “Kêço” *Folklorê Kurdan*, r. 47-55.

lihevxiştî ku tê pêşiyê, li esilê xwe vedigere û tişte dikeve navbera daçek û lêkera alîkar a hevedudanî, mîna van lêkerên li jêrê:

*jê mijûl bûn: Tu **ji** kê **mijûl dibî?***

*jê xweş bûn: Ez **ji** vê kira hanê **xweş bûm.***

*lê guhdar bûn: Ew **li** me qet **guhdar nabe.***

*lê bar kirin: Bernameyê **li** kompîtera xwe ya nû **bar bike.***

*pê aciz bûn: Ew **bi** xwarina kartû **aciz bû.***

*pê emel kirin: Gelo tu **bi** çî karî **emel dikî?***

4.1.4. Lêkerên Veqetînbare ên bi Cînavkeke Lihevxiştî, bi Paşdaçek û Lêkereke Xwerû

Ev ji cînavkeke lihevxiştî, ji paşdaçêkek û ji lêkereke xwerû çêdibin. Cihêtiya van a sereke ji yê din tenê ew e ku piştî cînavka lihevxiştî paşdaçêkek jî heye. Ji bo zelalbûna mijarê tevî hevokên nimûneyî çend lêkerên mînak:

*pê de çûn: Sola wî **bi** avê **de çû.***

*pê de ketin: Ew **bi** xebata xwe **de ketiye.***

*pê re gihîştin: Eger ez **bi** vî karî **re bigihîjim.***

*pê ve kirin: Ta **bi** derziyê **ve kir.***

*tê de kirin: Wan zarok **di** avê **de kiribûn.***

*tê re çûn: Av **di** dewlê **re diçe.***

*tê re kirin: Tiliya xwe **di** kunê **re dikir.***

4.1.5. Lêkerên Veqetînbare ên bi Cînavkeke Lihevxiştî, bi Paşdaçek û Lêkereke Dariştî

Lêkerên ji vê komê, ji cînavkeke lihevxiştî, ji paşdaçêkek û ji lêkereke dariştî tên pê. Ji bo ronîkirina ravekirina van cure lêkeran, çend nimûne:

*pê ve danîn: Nivzêrk **bi** bûkê **ve danî.***

*pê re raketin: Gelek kesan xwestibû ku **bi** wê **re rakevin.***

*tê de hilhatin: Pênc kes çawan dê **di** vî xaniyê biçûk **de hilbên?***

4.1.6. Lêkerên Veqetînbare ên bi Bêjeyek, bi Cînavkeke Lihevxiştî û Lêkereke Alîkar

Ew lêkerên ku di bin vî jêrnawî de hatine nîşandan ji bêjeyek, ji cînavkeke lihevxiştî û ji lekerekê (çî xwerû çî dariştî) pêk tên. Cudahiya van lêkeran ji yê berê, berî cînavka lihevxiştî hebûna peyveke ji esilê navdêran e. Cînavkên lihevxiştî di van lêkeran de jî mîna yê berê li gorî rewşê, li gorî ku di hevokê de peywir digirine ser xwe, ji hev dibin an jî nabin. Gava ji hev veqetin, bireserek an jî hêmaneke hevokê dikeve navbera daçek û lêkera alîkar. Bi vî awayî lêker dibe lêkereke veqetînbare:

*dest pê kirin: Em dest **bi** dayînê **bikin.***

dev jê berdan: Dev ji min berde.

serî lê dan: Serî li kar daye.

serxweşî tê dan: Me serxweşî di Hevînd da.

Hin ji van lêkeran, ji ber ku cînavka wan a lihevxiştî ji rêsaya xwe ya adetî averê bûye, di dema kêşanê de ji hev venabin. Wekî lêkera “*ser jê kirin*” an jî “*şerjê kirin*”ê: Ev yek jî, ji “*jê kirin*”ê diqewime ku ew bi wateya “*birîn*”ê ye. Loma ew êdî wisan di zimên de cihgir bûye.

4.2. Lêkerên Veqetînbar ên bi Morfema

Lêkerên ji vê senifanê yan bi morfema /-a/yê yan jî bi /-î/yê çêdibin (wekî van lêkeran: *berî...dan*, *sonda...xwarin*). Ev morfemên hanê yan jî dengdêrek tê dawiya cureyeke bêjeya ji esilê navdêrê û pê ve dizeliqe, piştê jî lêkera alîkar tê. Di dema kêşanê de îcar bireser dikeve navbera bêjeya ku morfem hatiye dawiyê û lêkerê. Cudahiya van ji lêkerên veqetînbar ên bi cînavkên lihevxiştî ew e ku di gava kêşanê de bêje wekî cînavka lihevxiştî ji hev nabe, ango li esilê xwe danagere, tenê tişte (bireser) piştî morfemê tê. Ev cure lêker jî bi du awayan çêdibin.

4.2.1. Lêkerên Veqetînbar ên bi Morfema /-a/yê

Lêkerên ku di bin vî sernavî de tên senifandin, ji navdêrekê û ji lêkerekê alîkar pêk tên. Ev navdêr dibe ku sade yan jî dariştî bin. Ferqa van cureyên lêkeran, ji lêkerên veqetînbar ên ku bi cînavkên lihevxiştî pêk hatine, ev e: Di dema kêşanê de morfema (yan jî dengdêra) /-a/yê tê paşiya bêjeyê, piştê tişte û paşê jî lêker tê. Lê eger dawiya bêjeyê bi dengdêrekê biqede herfa pêwendiyê/pevgirêdanê tê pêşiya/-a/yê (yan /-w-/ an jî /-y-/) û piştî pêkhatina awayê ravekê (terkîbê) lêkera alîkar dikeve dewrê. Li ser vê /-a/yê jî divê bê gotin ku çendî ew bişibe veqetandeka binavkirî ya yekhejmar a mêtîyê jî, lê ew di van lêkeran de bi erka îzafeyê (veqetandekê) ranabe û pê ravek çênabe. Ew amrazêke zimanî ye û pir pir dikare bê gotin ku ew peywira berpêbûnê tîne cih. Ku bi kurtasî bê gotin, halê hazir di kurmançî de bi veqetandeka /-a/yê raveka diyarkirî ya yekehejmar çêdibe. Lê di wekî ji mînakên li jêrê dixuye, pê cureyekî lêkerê ya ji aliyê binyatî ve çêdibe. Wek nimûne, ji bo vê mijarê çend hevokên kurt:

Bi keviran bera wan dan.

Her tim behsa te dibû.

Kêfa zarokên taxê anî.

Qala serpêhatiya xwe kir.

Sonda te xwaribû.

Wê bêriya me dikir.

4.2.2. Lêkerên Veqetînbar ên bi Morfema /-î/yê

Ev lêker, ji bêjeyekê û ji lêkerekê alîkar çêdibin. Cihêtiya van ji yên li jorê, li şûna /-a/yê bikaranîna /-î/yê ye. Hemû rêsayên zimanî yên mijara berî vê ango

ya li jorê, ji bo wan jî derbasdar in. Li aliyê din bêjeya ku morfema /-î/yê tê paşya wê, dibe ku xwerû yan jî dariştî be û her wisan ev lêker jî hem têper hem jî teneper bin. Eger lêkera alîkar têper be ew jî têper e, lê lêkera alîkar teneper be, ev cure lêker jî teneper e. Her wiha, /-î/ya ku dabaş li serê ye ne îzafê ye û pê terkîb durist nabe. Wekî /-a/yê, pir pir dikare ji bo wê jî bê gotin ku ew bi erka berpêbûnê radibe. Di çêbûna van cure lêkeran de fonksiyona morfema /-a/ û ya /-î/yê, eynî ye.

Divê ji rewşeke taybet a forma van lêkeran bê behskirin. Ev lêkerên hanê (ji bo yên ku bi /-a/yê û /-î/yê çêdibin), gava tişte nekeve navbera wan, ew lêker ji hev nabin û ew di rewşa lêkerên hevedudanî de dixuyên. Ji bo zelalbûna mijarê çend hevokên mînak:

Çêlî çîrokeke seyr kir.
Camêr berî wan neda.
Êrîştî wan dikir.
Ferî xwendin û nivîsandinê bûbû.
Hînî xuyekî ne xweş bûye.
Nan dirêjî min kir ku ez jê bistînim.
Xwarî erdê bû ku kevirekî hilîne.
Pirtûk radesî me bûn.
*Zimanê kurdî dabeştî ser çend zaravayan dibe?*⁶⁶

37

Der heqê lêkerên veqetînbar de, çend xalên girîng:

I) Eger tişte bikeve navbera daçek û lêkerê, wê gavê ew (ango hêmanên lêkerê) ji hev dibin û ew êdî lêkerekê veqetînbar e. Mînak: *tê bihurîn* (ew di *mafê xwe bihurî*) û *hînî... bûn* (ew *hînî ba me bûye*).

II) Lêkerên ku ji cînavkên lihevxiştî û ji hêmanên din çêdibin, di wexta kêşanê de eger cînavka lihevxiştî ji hev nebûbe û hêmanek neketibe navbera daçek û lêkerê, cînavka lihevxiştî tenê ji bo kesê sêyem ê yekhejmar e. Di halê jihevbiyê de, ji bo her cînavkê ye. Wekî van nimûneyan: *lê dan* (*lê bide, li wan sazan bide*), *pê ketin* (*pê dikeve, bi me rebenan ketiye*) û *tê gihîştin* (*ez tê digihîjim, ez di wan gihîştim*).

III) Hin cînavkên lihevxiştî ji rewşa xwe ya dêrin averê bûne û bûne wek pêrkîtên çêkirina lêkeran, ji lew re ew ji hev nabin. Mîna van lêkerên hanê: *lê kirin* (*xanî lê bike*), *pê xistin* (*agir pê bixe*) û *tê ketin* (*tê bikeve hundir*).

IV) Rewşa van lêkerên ku ji cînavka lihevxiştî û ji lêkerekê alîkar hatine pê, ji lêkerên sade, dariştî û hevedudanî cuda ye. Di meseleya ergatîfîyê de rewşeke din dertê holê. Loma nikare bê gotin ku “*Min li wan dan*”, ji lew re wek ku tê zanîn, gava lêker têper bin, wekî di dema niha, bê û raweya fermanî de, lêker bi

⁶⁶ Di hin devokan de, wekî ya Farqînê, ne bi temamî be jî di zimanê devkî de li cihê morfosentaktîka /-î/yê, ya /-ê/yê jî tê bikaranîn: Mîna “*ez hînê wan bûme*”.

kirdeyê re ahengdar e, ji lêkerê kirde tê naskirin. Îcar di demên borî de ji lêkerê tişte tê naskirin. Mînak:

Ez sêvê dixwim.

Min sêv xwarin.

Ew pirtûkan dixwîne.

Wî pirtûk xwendin.

Gava lêker lêkerên veqetînbar bin, ji ber ku beriya tişteyê daçekêk tê, êdî di dema borî de bi lêkera têper ew yekhejmarî yan jî pirhejmariya tişteyê nikare bê nîşandan. Tişte pirhejmar an jî yekhejmar dibe; nimûne:

Wî ji min pir xwaribû.

Wî ji nas û dosatan pir xwaribû.

Min li sazê da.

Wan li sazan da.

Wan ji zarokan hez kir.

Encam

Rêziman, ku bi awayekî kurt û puxteyî bê gotin, binyata zimên û pergala xebitîna zimên vedikole; li ser mijarên wekî deng, teşe, bêje, senifana bêjeyan, kêşan, erk û pêwendîya wan a li nav hevokê, ango li ser hevoksaziya zimanekî radiweste û rêzikên wan dipeyitîne. Rêzikên peyitandî jî ji bo bikaranîna rast a zimanekî dibin alîkar. Ji lew re rêziman dikare wek rêbera zimên jî bê pênasikirin ku ew hem rênîşandera bikaranîn û axaftina rast a zimanekî hem jî ya rastnivîsîna wî zimanî ye.

Ji ber ku rêziman ev çend girîng e, divê qet nebe di navbera zimannas û amadekarên rêzimana kurmancî de, di warê mijarên sereke de ramanên pir ji hev dûr nebin. Lê dibe ku cudahiya nêzikahîtdanê ya ji aliyê metodê ve û bikaranîna termînolojiyê di navbera wan de hebe. Her wisan dibe ku der barê mijarên spesîfik de jî raman û nêrînên wan ne mîna hev bin. Lê divê ku bi awayekî tevahî şayes û peyitandinên wan ên rêzikên zimanekî hev bigirin, an jî qet nebe li ser mijarên hîmî yên zimanekî, nakokiyên wisan beloq û berbiçav tune bin.

Piştfî vekolana rêzimanên li ser zaravayê kurmancî yên ku bûne mijara xebatê hat dîtî ku ramanên amadekarên gramerên li ser zaravayên kurmancî yên li ser cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve û der barê lêkerên ku bi cînavkên lihevxiştî û bi alîkariya morfemên /-a/ û /-î/yê ve hatine dariştin (ku ji aliyê me ve wek lêkerên veqetînbar tînin binavkirin), ji hev pir cuda ne. Ne hejmara wan a cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve hev digirin ne jî senifana wan a der barê lêkerên de. Der barê van yekan de, nakokîya di navbera wan de xwe bi awayekî pir aşkera dide der.

Ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran ên di kurmancî de li gorî hinekan didu, li gorî hinekan sisê û li gorî hinekan jî çar e. Eger bi awayekî tevahî bê gotin; li gorî

van berhemên ku bûne dabaşa xebatê, di kurmancî de ji aliyê binyatî ve şeş cure lêker hene: Wekî lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, lêkerên hevedudanî, lêkerên alîkar, lêkerên biwêjî û lêkerên qertaf. Li gorî peyta me, lêkerên alîkar, lêkerên biwêjî û lêkerên qertaf nabe di polîna “ji aliyê binyatî ve cureyên lêkeran” de cih bigirin. Ji lew re lêkerên alîkar, di lêkerên hevedudanî de bi rola alîkariyê radibin û bi saya wan bêjeyeke ji esilê navdêrê tê kêşan. Herçî lêkerên biwêjî ne, bi çemka biwêjê bal li wateya lêkerê tê kêşan û ew ji aliyê semantîk ve rewşa lêkerê derdibin. Her wisan, lêkerên qertaf jî ku mebest jê gireyên kesane ne, di dema kêşana deman a lêkeran de ew kesan/tiştan dinimînin û bi saya wan hem pirhejmarî û yekhejmarî hem jî rêza kesan/tiştan tê zanîn û naskirin. Eleqeya wan bi cureyên lêkeran a ji aliyê binyatî ve nîn e. Wek nav, bi ya me polînkirina lêkerên xwerû, dariştî û yên hevedudanî rast in.

Lêkerên ku ji aliyê me ve wek lêkerên veqetînbar hatine binavkirin, di rêzimanan de, ku ew bûne mijara lêkolîna me, hat dîtin ku ji aliyê amadekarên berhemana ve ji wan re lêkerên hevedudanî, lêkerên biwêjî û lêkerên bidaçek hatine gotin. Der barê wan lêkeran de jî nikare ji lihevhatinekê bê behskirin.

Di bin navê lêkerên veqetînbar de, ji aliyê me ve du cure lêker hatin destnîşankirin ku di rêzimanan de bi awayekî serbixwe ji wan nehatiye çêlkin. Ji ber lêkerên bi van cînavkên lihevxiştî (*jê, lê, pê û tê*) hatine çêkirin, di çaxa kêşana deman de ji hev vediqetin, li hêmanên xwe yên eslî vedigerin û bireser dikeve navbera daçek û lêkera alîkar; ku ev taybetiyeke wan a cudaker a ji lêkerên din e. Çend nimûne ji bo koma yekem a ku bi cînavkên lihevxiştî pêk hatine: *jê çûn, lê dan, pê ketin, tê dan, jê xweş bûn, lê guhdar bûn, pê emel kirin, pê de ketin, pê re gihîştin, tê re kirin, tê de hilhatin, dest pê kirin, serî lê dan, serxweşî tê dan.*

Koma duyem a ji lêkerên veqetînbar jî, ew lêker in ku di dema kêşanê de ew jî ji hev dibin. Cudahiya van ji ya pêşî ew e ku di wan de cînavkên lihevxiştî tune ne. Ev lêker ji bêjeyeke ji esilê navdêrê, ji hêmaneke rêzimanî/morfosentaktîk */-a/yê* yan jî ji */-î/yê* û ji lêkerê pêk tên. Mîna van nimûneyan: *behsa...kirin, bera...dan, bêriya...kirin, kêfa...anîn, sonda... xwarin, berî... dan, çêlî...kirin, dirêjî...kirin, êriştî...kirin, ferî...bûn, hînî...kirin, radeştî...bûn. xwarî...bûn.*

Wek gotina dawî: Eger bi awayekî puxteyî bê gotin, piştî vekolîn û nirxandinên xwe, di bin ronîya pênaseyên cureyên lêkeran ên ji aliyê binyatî ve em gihîştin wê hizirê ku di zaravayê kurmancî de, ne şeş, lê belê ji aliyê binyatî ve çar cure lêker hene. Ew jî ev in: Lêkerên xwerû, lêkerên dariştî, lêkerên hevedudanî û lêkerên veqetînbar (ku ev a dawî jî aîdî me ye ku li senifanê hate zêdekirin).

Çavkanî

AKDAG, Zekî, *Çirokên Gelêrî yên Kurdan (Herêma Semsûr û Ruhayê)*,

Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2016.

ALTUĞ, Halil, *Gramera Kurdî (Kürtçe Gramer)*, Avesta, İstanbul 2013.

BARAN, Bahoz, *Rêzimana Kurmancî*, Belkî, İstanbul 2012.

- BARNAS, Rojan, “*Lêkerên Hevedudamî*”, Kurmancî, h. 5, Weşana Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, Parîs 1989.
- BAYRAV, Süheylâ, *Filolojinin Oluşumu*, Multilingual, İstanbul 1998.
- BAYRAV, Süheylâ, *Yapısal Dilbilim*, Multilingual, İstanbul 1998,
- AKSAN, Doğan, *Her Yönüyle Dil, Ana Çizgileriyle Dilbilim*, 4. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2007.
- ATABAY, Neşe, Sevgi ÖZEL & İbrahim KUTLUK, *Sözcük Türleri*, 2. baskı, Papatya Yayıncılık, İstanbul 2003.
- BADILLI, Kemal, *Türtçe İzahlı Kürtçe Grameri (Kürmançça Lehçesi)*, Med Yayınları, İstanbul 1992.
- BALÎ, A., *Kürtçe Dilbilgisi Türkçe Açıklamalı/ Rêzimana Kurdi*, Alan Yayıncılık, İstanbul 1992.
- BEDİR HAN, Celadet Ali & Roger LESCOT, *Kürtçe Gramer*, (Wergera ji fransî; li jêr çavdêriya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê), Avesta, İstanbul 2004.
- BEDİR-XAN, Kamuran Ali, *Türkçe İzahlı Kürtçe Grameri*, Weşanên Deng, İstanbul 1991.
- BÊKES, Kamiran, *Bingehên rêzimana kurdî/zaravê kurmanciya bakur, Weşanxane?*, Osnabrück 2004.
- BÎLÎZ, Mahpus, “*Kêço*” Folkloru Kurdan, h. 3, Weşana Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, İstanbul 2015.
- CELÎL, Ordîxanê & Celîlê CELÎL, *Zargotina Kurda I*, çapa 3., Aram Yayınevi, İstanbul 2013.
- CIWAN, Mûrad, *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanc Lehçesi)*, Weşanên Jîna Nû, Balinge 1992.
- FISHER, Steven Roger, *Dilin Tarihi*, 3. basım, Muhtesim Güvenç (Çev.), Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları, İstanbul 2015.
- GAZÎ, Mustafa, *Ferheng Kurdi-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, İstanbul 2006.
- HACIEMİNOĞLU, Necmettin, *Türk Dilinde Yapı Bakımından Fiiller*, Bilge Kültür Sanat, İstanbul 2016.
- HENGİRMEN, Mehmet, *Türkçe Dilbilgisi*, 8. baskı, Engin Yayın Evi, Ankara 2005.
- HOBERG, Rudolf & Ursula, *Duden Almanca Gramer*, Mihan Çatak (Kurt) & Mehmet Çatak (Çev.), Alfa Yayınları, İstanbul 2003.
- HUBER, Emel, *Dilbilime Giriş*, Multilingual, İstanbul 2008.
- İMER, Kâmile, Ahmet KOCAMAN, A. Sumru ÖZSOY, *Dilbilim Sözlüğü*, Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi, “Yapı”, İstanbul 2011.
- KARAAĞAÇ, Günay, *Dil Bilimi Terimleri Sözlüğü*, Türk Dil Kurumu Yayınları, “Yapı”, Ankara 2013
- KORKMAZ, Zeynep, *Türkiye Türkçesi Grameri (Şekil Bilgisi)*, 3. baskı, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2009.
- KURDO, *Gramera Zmanê Kurdi (kurmanci-sorani)*, Koral Yayınları, İstanbul 1991.

- SAGNIÇ, Feqi Huseyn, *Hêmana Rêzimanê Kurdi*, Melsa Yayınları, İstanbul 1991.
- TAN, Samî, *Rêzimana Kurmancî*, Çapa nûkirî ya 3., Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul 2015.
- TOPTAŞ, Hüseyin, *Türkçe Dersler 1. Kitap*, Papatya Yayıncılık Eğitim, İstanbul 2016.
- Türkçe Sözlük, Türk Dil Kurumu Yayınları, 11. baskı, Ankara 2011.
- VURAL, Hanifi & Tuncay BÖLER, *Ses ve Şekil Bilgisi*, Kesit Yayınları, İstanbul 2014.
- YERYÜZ, İsmail, “İkinci Baskıya Önsöz”, di Süheylâ Bayrav *Yapısal Dilbilimi* de, Multilingual, İstanbul 1998.
- YILDIRIM, Kadri, *Temel Alıştırma ve Metinlerle Kürtçe Dilgisi (Kurmancî Lehçesi)*, 2. baskı, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul 2012.

